FACTSHEET

Beşa Perwerdeyê ya NSW

Student use of mobile phones in schools

Information for parents and carers

# Bikaranîna telîfonê li dibistanan

Agahî ji bod ê-bav û çavdêran

## Li dibistanên amadeyî qedexeya li ser telîfonan niha di cih de ye

Qedexekirina bikaranîna telîfonan li dibista-nên amadeyî, li ser qedexeyê ye ku berê li dibistanên seretayî yên giştî yên NSW'ê ye.

Ev qedexekirin di dema dersê de, di bêhn-vedanê û firavînê de ye. Dema ku xwen-dekar diçin û tên dibistanê dikarin telîfone hilgirin bi xwe re.

Midûr û mamoste dikarin destûrê bidin ku telîfonan ji bo armancên perwerdeyê werin bikaranîn an jî di çarçoveya sererastkirineke maqûl de ji bo hînbûn û tenduristiya xwen-dekaran.

Beşa Perwerdeyê ya NSW ji bo pişt-girîdayîna qedexeyê ji dibistanan xwestibû ku di gelek vebijarkên pêkanînê de bi ci-vakên xwe yên herêmî re bişêwirin.

Ev vebijêrk jî di nav de:

**Girtî û dûr:** Telîfon girtî û veşartî ne (bi gelemperî di çenteyê dibistanê yê xwen-dekaran de). Telîfon ji bo dema dibistanê de nayên bikaranîn.

**Telîfon di dolabê de ne:** Xwendekar telîfo-nan bi xwe re naynin; divê ew dema dibi-stanê  de di dolabê de bimînin.

**Çenteyê telîfonê yê kilîtkirî:** Xwendekar telîfona xwe di çenteyeke polatî yê kilîtkirî de bi cih bên kirin û di dema dibistanê de nikarin telîfona xwe bi kar bînin. Di dawîya roja dibistanê de çente yê polatî bê vekirin.

**Telîfon li ofîsa pêşîn dê bên kom kirin:** Xwendekar di destpêka roja dibistanê de telîfonên xwe li ofîsa pêşîn a dibistanê bi-hêlin û di dawiya roja dibistanê de (an jî dema ji avahiyên dibistanê derdikevin) kom bikin.

**Telefonên ku di destpêka dersê de hatine komkirin:** Telefon ên ji aliyê mamoste ve di destpêka waneyê de tên komkirin û depoki-rin û piştî ku ders bi dawî bû li xwendekar vedigere û/an ku xwendekar ji polê der-dikeve.

Civakên dibistanê yên takekesî, biryar dan ku ji bo bicihanîna polîtîkayê kîjan vebijarkê qebûl bikin.

## Di demjimêrên dibistanê de pêwendiya xwendekaran bi dê û bav û çevdêran re

Dibe ku di dema dibistanê de hin caran hewce bike ku dê û bav an jî çavdêr bi xwendekaran re têkiliyê deynin an jî berevajiyê wê. Dê û bav û çavdêr dikarin bi rêya ofîsa dibistanê bi dibistanê re têkiliyê deynin û xwendekar jî dê karibin bi rêya ofîsa dibistanê bi dê û bavan re têkiliyê deynin.

### Servîsa wergêrên li ser telîfonê

Heger hûn agahiyê zêdetir bixwazin ji kere-ma xwe li dibistanê bigerin. Heger ji bo alîkarîya lêpirsîna we hewcehîya we bi wer-gêrekî hebe, ji kerema xwe li ser 131 450 bi Xizmeta Wergêran li ser Telîfonê bipeyvin û bi zimanê xwe tercûmanekî bixwazin.

Ji operatorê re hejmara telfonê ya ku hûn dixwazin lê bigerin bibêjin û ji bo ku di axaftinê de bibe alîkar wê operator li ser xetê wergêrekî bibîne. Ev xizmet belaş e.